SERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com | Hejmar: 20 | Dîrok: Îlon 2026 | Biha: 2000 | DENGÊ ŞOREŞ Û AZADIYÊ



Ji bo **Ahmet Polad** û **hemû êsîran** Azadî...

Parastina Rojava; parastina destkeftîyên şoreşê ne



2 NERÎN: Ji Bo Pêşeroja Rojava Divê Xwedî Li Destkeftiyên Şoreşê Derkevin

4 CIWAN: Zimanê Me Bingeha Hebûn û Pêşeroja Me Ye

5 DÎROK: Dîtina şoreşgerî ya Pêşengê Komûnîst a li ser Rojhilata Navîn

8 NIRXANDIN: Serê Kaniyê hê jî li benda vegera gelê xwe ye

Erka Herî Bingehîn a Rojane Ye:

Ji Bo Pêşeroja Rojava Divê Xwedî Li Destkeftiyên Şoreşê Derkevin



Dewletên mêtîngehkar, emperyalîstan û çeteyên cîhadîst ên ku bi wan re hevkarî dikin, li ser heman maseyê rûniştin û li hemberî şoreşa Rojava planeke amade kirin. Li Parîsê, Ammanê û Riyadê hevdîtinên dirêj kirin. Û li ser encamê ku şoreşa Rojava tasfiye bikin, bûn yek. Ji ber ku, bi wesfa xwe yê gelparêz, demokratîk û azadîxwaziya jinan, şoreşa Rojava ji bo wan dihat wateya "dijmineke ideolojîk". Heta ku şoreşa jinê ya Rojava dijin, plana ku emperyalîst û dewletên mêtîgehkar ji bo Rojhilata Navîn xeyal dikirin nedihat pêkanîn. Rojava, ji dilê gelên Rojhilata Navîn ve hemû cîhanê re hêviya wekhevî, adalet û azadiyê derzî dikir. Ji ber vê yekê komkujiyên bi xwîn, qirkirina gelan, ji nû ve xêzkirina sînoran li ser nexşeyê û destguherandinê bajaran a bi rêya dagirkirin; girtina biryarên wiha ji bo emperyalîst û mêtîngehkaran tiştekî gelekî hêsan bû. Di dîroka wan de mînakên xêzkirina sînorên axên di bin dagirkeriyê de yên bi danîna cetweleke li ser nexşeyê jî hebûn.

Neteweya Kurd bêdewlet û bêstatû hiştin. Û mayîna gelê Kurd di vê rewşê de ya sedsaleke din jî berjewendiya wan bû. Dewletên mêtîngehkaran ên ku li ser çar perçeyên Kurdistanê hikum dikin, li hemberî daxwaza xweseriyê ya Rojava derketin; bi şîara "Bila Kurd nebin xwedî statû, ka çi dibe bibe", bi dewletên emperyalîst re bazartiyên mezin kirin û tavizên dan. Bes ku Kurd nebin azad. Û ji fikra xwedî dewlete xwe ya serbixwe, dûr bikeve.

Di vê qonaxa dîrokî de, ku Kurdên ji çar parçeyên Kurdistanê û dostên Rojava li çaraliyê cîhanê rabûne ser piyan, planên qirêj ên qirkirinê ji bo demekê hatine rawestandin û bîryareke danin ku Rojava bi bêdengî bi rêya entegrasyonê were tasfiyekirin.

Li Şêxmeqsûdê bi hezaran Kurd hatin revandin û qatilkirin. Di sêgoşeya Dêyr Hafir, Raqa û Sirrînê de bi sedan şervanên şoreşê hatin dîlgirtin. Hêzên şoreşê hin bajarên winda kirin. Bi rêya dagirkeriyê şoreş ket bin dorpêçê. Hêzên QSDê ber bi herêma Cizîrê ve hatin bertengkirin. Kobanê, ji bo ku di pêşerojê de wekî sedema şantajê bête bikaranîn di bin dorpêçê de hate hiştin.

Gelên Rojava, ji bo parastina bajarên xwe ketin tevgerê. Keç û xortan şoreşger ên gel, bi fedaîtiyên mezin berxwedan nîşan dan. Bi sedan şervanên jin û mêr mewziyên xwe bernedan û ji bo astengkirina derbasbûna dijmin canê xwe feda kirin û şehîd bûn. Hin ji wan li ser kolanan hatin înfazkirin. Cenazeyên wan jî nehatin girtin. Hin ji wan hêj di zindanên dijmin de di bin îşkenceyê de ne. Kesên ku paşve kişiyan, revîyan û çekên xwe danîn û teslîm bûn jî çêbûn.

Û rast e; hêza Rojava ji bo parastina axa Rêveberiya Xweser a li hemberî çeteyan û dewleta Tirk a mêtîgehkar têrê nekir. Di destwerdana pêvajoyê ya bi rihê seferberiya gel de lawazî çêbû. Hêzên şoreşê neçar man ku paşve bikişin. Li hemberî dagirkerî û tasfiyeya topyekûn a axa şoreşê neçar man hin taviz bêne dan. Pêvajoya ku jê re entegrasyon dihat gotin, mîna belayekê li ser serê gelên Rojava de barî. Ev di bingehê xwe de nîqaşeke demokratîk nebû, tevgereke tasfiyeyê bû. Pêş-qonaxa tunekirina Rêveberiya Xweser û hêza leşkerî ya serbixwe bû. Di vê qonaxê de şaşî jî hatin kirin, biryarên şaş jî hat danin.

Di dîroka Kurdistanê de gelek caran serhildan hatin kirin, komkujî hatin ditîn. Pêşengên serhildanan hatin qatilkirin, gel di qirkirinê re hate derbas kirin. Kurdistanê ev hemû jiyan û tecrube kirin.

Û niha, li rewşa heyî ya îro binêrin û ji vir ber bi paşve vegere, divê em vê tiştî bi netî bînin ser ziman: Erê, tişta hatî jiyîn şikestin e, binketin e. Rojava ya ku mîna welatekî serbixwe hebûna xwe diparast, bi alîkariya emperyalîst û dewletên mêtîgehkaran ber bi "Komara Erebî ya Sûriyeyê" ve tê entegrekirin. Hate ragihandin ku QSD hate feshkirin. Ev rewşeke bi rastî jî zehmet e ku mirov qebûl bike, ji ber ku bedelên giran hatine dayîn. Em dizanin ku gelê me jî ne razî ye. Lê belê, rastî ew e ku itifaqê paşverû yên li ser erdê, hezên Rojavayê neçar kirine ku van ferzkirinan qebûl bike.

Tevlî van hemû tiştên ku hatine jiyankirin jî, netewe Kurd ji daxwaza jiyana wekhev û azad a li ser axa xwe venegetiye, gavek paşve neavêtiye. Ti tiştê ku hatiye jiyankirin, ji daxwaza azadiyê ya gelê Kurd û ji hesreta Kurdistanê mezin de nîn e. Jinên Kurd, di biryardariyê de ne ku destkeftiyên ku di salên şoreşê de bi dest xistine winda nekin. Ji bo vê yekê sekna xwe ya rêxistinkirî berdewam dikin. Ji bo destwerdana li ser xirabbûna pêvajoyê, divê hêza şoreşger û rêxistinkirî ya gel di qadên çalakiyê de xwe nîşan bide. Hişmendiya welatparêziyê ya di dilê gelên Kurdistanê de domdar e. Tişta ku dê pêvajoyê berevajî bike, yekîtiya çalakiya şoreşger a bi milyonan bindestan û xurtkirina rêxistinbûnê ye. Mîna berteka gel a li hemberî rakirina lewheya Kurdî li Hesekê, mîna sekna net a gel a li hemberî êrîşên li ser koçberên Efrîn û Serêkaniyê, divê mînekên wiha bêne zêdekirin.

Aqilê dewletê yê burjuva, bi awayekî sîstematîk li ser talankirina destkeftiyên şoreşger-demokratîk dixebite. Her gava Şamê, amadehiya pêşîn a êrîşeke din a tasfiye û talankeriyê ye. Û çawa ku tavizan bi dest dixe, dest bi amadehiya gava nû dike. Ji ber vê yekê, di parastina destkeftiyên heyî de sekneke şoreşger a gelekî net hewce ye. Dorpêça li ser tasfiyekirina şoreşa jinê ya Rojava tenê bi vê awayî dikare bên belavkirin.

Gotin û şîroveyên mîna "Şamê di rewşa heyî de xweseriya Rojava qebûl kiriye" ji bilî tevlîhevkirina hişmendîyê mirovan û astengkirina gel a li derdora hêzên şoreşê ti armanceke din nagirin. Rojava xweserîya xwe bi dest nexist. Berevajî vê, berî her tiştî avahiya xweseriya siyasî û ekonomîk a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hate winda kirin. Xebata saziyên Rêveberiya Xweser a ku bi Hevpeymana Civakî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ve girêdayî bû hate rawestandin. Ev di heman demê de xebitandina qanûn û hiqûqa heyî ya saziyên şoreşê nehatina meşandin û tune hesibandina van e. Tê wateya ku hêzên leşkerî yên serbixwe yên Rojava û rêxistinên xweparastinê nikarin mîna berê bên berdewam bikin. Van windahiyên û birînên gelekî giran in. Derbên gelekî mezin in ku şoreşa Rojava xwarine.

Rast e, şoreşê derbeyên gelekî mezin xwarin. Lê ev hemû tişt naye wateya ku "dawiya cîhanê hatiye". Di dîroka şoreşan de, bi qasî destkeftiyên mezin, windahî jî hatine jiyankirin. Rastiyek e ku di qadê de her tişt li gorî îradeya hêzên şoreşê nemeşiyan. Lê hêzên şoreşê bi gotina "hemû tişt qediya" ê venagerin malên xwe û serê xwe nedin nav lepên xwe û nerûnên. Ji bo parastina destkeftiyên heyî û bêguman ji bo geşkirina wan a di pêşerojê de ê têkoşînê berdewam bikin.

Komûnîstên Rojavayî, di hemû salên borî yên şoreşê de li ser erka xwe bûn. Ji dema ragihandina şoreşê ve, di hemû hemleyên parastina axa şoreşê ya li hemberî hemû çeteyên cîhadîst-selefî û nexasim DAİŞê de û di hemleyan rizgarkirina bajaran de em hebûn. Em hevparê serkeftina li dijî DAİŞê û berxwedana ku şoreşê mezin dike ne.

Li hemberî êrîşên dagirkeriyê yên li ser axa şoreşa Rojava, ji Efrîn û Serê Kaniyê heta Dêyr Hafir û Tişrînê di xetên herî pêşîn ên hemû berxwedanan de me şer kirin, me mewziyên xwe bernedan. Di van berxwedanan tewayî de me bi dehan hevalên xwe şehîd dan. Îro jî ku mezin kirina berxwedana şoreşger erka herî bingehîn e, em ê ji girtina berpirsiyariyê nerevin. Em ê xwedîderketina li şoreşa jinê ya Rojava û destkeftiyên xwe bidomînin. Ev, berî her tiştî hewcedariya girêdana me ya bi armanca Kurdistaneke Sosyalîst a Yekbûyî û Azad re ye. An Serkeftin, An Serkeftin!

Parastina Destkeftiyên Jinan Parastina Şoreşê Ye

Dema ku dihat gotin destkeftiyên jinan, tişta dikeve hişê me çi ye? Gelo em tenê wekî "tiştên ku eleqeya xwe bi jinan re heye" difikirin? Dema ku mijar dibe parastina destkeftiyên jinan, gelo "em wekî mêrên ku di şoreşa Rojava de cih girtine" dibêjin ev mijar eleqedarî jinan e û parastin jî erka wan e? Heke tu di nava şaştîyeke wiha de bî, divê tu demildest jê vê fikirê derkevîn. Ji ber ku îro parastina destkeftiyên jinan, ji bo parastina şoreşa me ya Rojava di asteke jiyanî de girîng e. Ji ber ku di vê mijarê de her taviza ku were danin, ji bo gavên ku dewleta Tirk a mêtîrkar û çeteyên HTŞê ji bo tunekirina şoreşê bavêjin re dibe zemîneke.

Qanûnên jinan ên ku bingehê şoreşê ne, ji bo azadkirina civakê û domandina jiyanê li ser bingeha edalet û wekheviyê hene. Li hemberî rejîma BAASê ya mêtîrkar û nîzamê eşîretî yê paşverû û feodal, ji bo jinan destkeftiyên bingehîn hatin afirandin.

Madem wiha ye, destkeftiyên jinan çi ne?

1- Pirhevjînî û zewaca di temenê zaroktiyê de di qanûnên jinan de hatine qedexekirin. Ev qanûn xaleke ku li ser wekheviya jin û mêran hatiye avakirin e. Pirhevjîniyê, tê wateya jiholêrabûna têkiliya wekhev. Çawa ku jin zewaca bi zêdetirî mêrekî re wekî mafê xwe nabînin, divê mêran jî ji bo xwe nedîtin.

Zewaca di temenê zaroktiyê de, ne tenê ziraran dide bedenê jinê; di heman demê de pirsgirêkên wekî hevberdana zû û xapandinê derdixe holê û bûye yek ji sedemên girîng ên pûçbûna civakî. Sedema zêdebûna hevberdanê ya ku îro herkes jê bi gileyî ye, malbatên ku zarokên xwe di temenê zû de dizewicînin û dikevin xeyala ku wê bên parastin in. Heke em nexwazin di pêşerojê de ji pirsgirêkên civakî yên cuda gileyî bikin, divê em di nava kesên ku vê qanûnê diparêzin de cih bigirin. Em xwe bi gotinên wekî "Nesîba wê hat, me evladê xwe dan" nexapînin. Ku ciwan jiyanê nas bikin û piştî ku pêşeroja xwe ava kirin bizewicinin, civakeke biwesfeke mestir diafirîne. Qanûnên jinan, ji bo têkoşîna li dijî zewaca di temenê zû de bûne bingeha hiqûqî.

2- Jinan di asta qanûnê de di mijarên mîras, şahidî û hevberdanê de mafê wekheviyê bi dest xistin. Van mafên herî bingehîn ên mirovan ne. Di asta destûrê de hate qebûlkirin ku jinên ku nîvê civakê pêk tînin ne nîvmirov in; mirovin wekhev û azad in.

3- Sîstema hevserokatiyê û temsiliyeta wekhevî hatine sazîkirin. Bi vê qanûnê re mîsogerkiriye ku jin bi qasî mêran di asta siyasî û îdarî de cih bigirin hate peydakirin. Di salên şoreşê de, jinan ev tişt bi serkeftî bi dest xistin. Rêveberên jin, siyasetmedar û jinên di pîşeyên cuda de, bêyî ku serî li ti hîleyan bidin, bi heqê keda xwe nimûneyên çêkirina tiştan ji bo civakê afirandin.

4- Bi damezrandina rêxistinên xweser ên jinan wekî Mala Jin, JKŞ, Weqfa Jinan a Sara û Kongra Star, ji pirsgirêkên têkoşîna azadiya jinan re çareserî hatin lêgerîn. Ji bo parastina mafên jinan, dawîkirina rewşa bêhiqûqî ya li dijî jinan û xebatên ji bo pêşengtiya jinan hatin meşandin. Di heman demê de bi reya avakirina rêxistinên a hemast de rêxistinbûna jinan hatin mîsogerkirin. Bi vî awayî şuna têkoşîna jinê ku tenê serê xwe li dijî serdestiya mêran, zemîna têkoşîna bi hêza rêxistina xwe hate afirandin. Ev rêxistinên wekî saziyên Asayîş-Jin û HPC-Jin in.

5- YPJ wekî artêşeke jinan hat afirandin. Bi dirûşmeya "Jinan, şoreşa jinê diparêzin û mezin dikin" re jinan jî tevlî şer bûn. Mînakên fermandarbûna jinan û fedaîtiyê hatin afirandin. Wekî di mînakên berxwedana Kobanê, Efrîn û Tişrînê de, jinan çend caran destana parastina mewziyên xwe bi bedela jiyanê xwe, hate nivîsandin.

6- Dadgehên adaletê yên jinan hatin ava kirin. Ev dadgeh li hemberî hemû cûreyên tundî, destdirêjî, tacîz û kuştinê yên li dijî jin û zarokan hatine kirin, ji nêrîna jinê ve nêzîkbûn û mafê jinê parastin. Ev dadgeh ji bo ku dirûşmeya "Adaleta ne ji aliyê mêran, adaleta rastîn" jiyanî bibe têkoşiyan.

Çeteyên HTŞê bi alîkariya emperyalîstan û dewletên mêtîrkar ên herêmê li Şamê bi cih bûn. Li hemberî şoreşa Rojava siyaseteke lawazkirin û tasfiyeyê tê meşandin. Di vê çarçoveyê de yekemîn icraata ku hate kirin, tunehesibandina mafên jinan e. Çeteyên HTŞê yên cîhadîst bi gotina "Pêşî li jinan lêxin" armanc dikin ku şoreşa me hilweşînin. Porên jinan ên ku di dema şer de wekî xenîmet hatin jê kirin, guhên wan ên hatin jê kirin û avetina cenazeyên hevreyên me ji balkonan di bîra me de ne. Em ê van tiştan qet ji bîr nekin.

Niha jî, sankî ne ku ji ti tiştî berpirsiyar nîn in, difikirin ku li ser maseyan rûdinin û biryarê li ser pêşeroja Rojava bidin. Li ser pêşeroja Rojava tenê gelê Rojava, li ser pêşeroja jinan jî em jinên Rojavayî dikarin biryarê bidin.

Di meclîsa ku wan bi xwe li Şamê ava kiriye de çend jin hene? Bi nêzîkatiya "bila di nav de jineka jî hebe" nikarin jinên Rojava bixapînin. Ev çeteyên ku jinê wekî mirov naye qabulkirin û mafên jinan tune dihesibinin, li şûna "Wezareta Jinan" saziya "Wezareta Malbat, Karên Civakî û Xebatê" ava kirin. Ji ber ku wan çeteyan, jinên wekî ferdekî serbixwe nabînin, tenê di nava malbatê de wekî dayik an jî hevjîn dibînin. Jinên nezewicî di çavên wan de tune dihesibinin. Gore fikra wan, jineka ku hevjînê wê miriye û zarokê wê tune ye nîne. Bi fizîkî heye lê li ser qanûnê tiştek nîne. Di sîstema ku van çeteyan cîhadîst ava kiriye de mekanîzmayeke ku jin li hemberî neheqiyeke ku rastî wê hatibe mafê xwe biparêze tune ye. Jinê wekî "miroveke", wekî "kirdeyeke" nahesibînin. Jinê tenê wekî perçeyekî malbatê qebûl dikin.



Lêkolînên ku hatine kirin nîşan didin ku: Tundiya li ser jinan û kuştina jinan herî zêde ji aliyê mêranên herî nêzî wan ve hatiye kirin. Ango ji aliyê bav, bira an jî hevjînê wan ve. Di qanûnên ku serdestiya mêran esas digirin de tişta esas parastina malbata ku jin di nav de wekî kole tên qebûlkirin e. Ji ber vê yekê jinan, cihên ku rastî tundiyê tên ditin an jî bi mirinê tên tehdîtkirin, mehkûmî di vê cihê da jiyana xwe berdewam bikin. Ji ber vê yekê, yek ji qanûnên yekem ên ku li Şamê hate derxistine, zewaca duyemîn bû. Niha dê du jin jî ji ber qanûnên wan neçar bimînin ku jiyaneke ku naxwazin bijîn.

Di qanûnên wan çeteyan de jinan cih nagirin. Ji ber vê yekê naxwazin ti qanûnên me ya jinan qebûl bikin. Ji bo ku rê li ber hebûna me ya wekî mirovên wekhev bigirin tişta ji destên wan tê dikin. Tişta ku ew jê ditirsin, îrade û biryardariya jinê ye. Ji ber ku ew dizanin ku ji bilî zincîrên jinan tiştekî wan ê ku winda bikin tune ye. Ji ber vê yekê naxwazin jin bibe xwedî îrade û bi mêran re bibe wekhev.

Lê tiştekî ku divê neyê ji bîr kirin heye: Qanûnên jinan biryarên ku li ser maseyê hatine nivîsandin û jêbirin nîn in. Li hemberî çeteyên DAİŞê, barbariya emperyalîst û dewletên mêtîrkar ên herêmê, bi can û xwîna hezaran jinan, bi ked û bedelan mezin gelek destkeftî hatin bi dest xistin. Ji ber vê yekê, wan çeteyan nikarin destkeftiyên me yên jinan li ser maseyê betal bikin.

Divê em vê tiştî bi biryardarî û israra xwe ya di parastina destkeftiyên jinan de derxînin holê. Divê em ji bîr nekin ku asta parastina me ya her destkeftiyeke, dê bi wê yekê bên pîvand ku em çi qasî wekheviyê diparêzin. Mêreke ku wekheviya bi jinê re neparêze, di mijarên din de jî nikare daxwaza wekheviyê bike. Mêreke ku adaletiyê neparêze, nikare adaletê ji bo xwe bixwaze. Ev mijareke tevahîyê û divê di hemû qadên jiyanê de bên nîşandan. Di rewşeke berevajî de jinan ji bo parastina destkeftiyên xwe têkoşînê berdewam bikin û di parastina wekhevî û adaletê de pêşengtî bikin. û mêran jî bibin bareke li ser milên jinan.

Zimanê Me Bingeha Hebûn û Pêşeroja Me Ye

Têkoşîna dîrokî ya gelê Kurd û tecrubeyên gelên bindest nîşanî me didin ku aqilê dewletê ê ku siyaseta înkarê dimeşîne, berî her tiştî êrîşî ziman û dîroka civaka ku tune dihesibîne dike. Ziman, tenê amûreke ragihandinê nîne. Ew şîfreya çandê, hafizeya kolektîf a civakê, bîra nifşan, dîrok û awayê fikirînê ye. Ji dest stendina zimanê gelêkî, di rastiyê de ji dest stendina rih û hebûna wî ya neteweyî ye. Gava zimanê neteweyekê tê qedexekirin an jî di qada giştî de tune tê dîtin, armanc tenê sînorkirina peyvan nîne. Armanc, qutkirina têkiliya di navbera nifşan de, lawazkirin û çûrîkirina hişmendiya kolektîf a neteweyî ye.

Ev rastî, di dîroka gelê me de gelek caran hatine dîtin. Polîtîkayên asîmîlasyonê yên li dijî gelê Kurd tenê ji qedexeyên îdarî pêk nehatin. Nasnameya me ya neteweyî hate înkarkirin. Zimanê Kurdî di qada giştî de bi awayekî sîstematîk hate cudaşêwarkirin. Zarokekî ku nikare bi zimanê dayika xwe bixwîne û binivîse, têkiliya xwe ya bi dîrok û civaka xwe re winda dike. Gelê me li hemberî vê têgihiştina qedexekar li ber xwe da. Kurdî ya ku ji aliyê serdestan ve tune dihat dîtin, di malan de, di stranên dengbêjan de, bi bîranîn û çîrokan ji nifşekî re derbasî nifşê din hate kirin û hate parastin.

Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re di sala 2012an de, berxwedana me ya ji bo zimanê Kurdî jî gihîşt qonaxeke nû. Gelê me di qadên berxwedanê de her tiştî re heman dirûşme bilind kir: “Zimanê me hebûna me ye.” Ev îfade, ragihandina sekna siyasî ya gelê ku azadiyê dixwaze bû: Civakeke azad divê bi zimanê xwe bifikire û pêşeroja xwe ava bike.

Di gelek qadan de -ji malbatê heta dibistanê, ji çapemeniyê heta meclîsên gel, ji rêxistinên kêmneteweyî heta akademiyan- hebûna zimanê Kurdî di pêvajoya ji nû ve avakirina civakê de rolek girîng lîst. Kurdî li kolan û di hemû saziyan de cihê xwe dît. Dema ku ziman dibe zimanê perwerdehî, lêkolîn û zanistê, ew dibe amûra hilberîna jiyana civakî jî.

Îro, di şert û mercên nû yên Sûriyeyê de, yek ji mijarên bingehîn ên têkoşînê yên li ser pêşerojê, qebûlkirina Kurdî wekî zimanê fermî ye. Bêyî ku polîtîkayên yekparêz, netewperest û hişmendiya înkarkar bêne derbas kirin, avakirina Sûriyeyeke nû, demokratîk û li ser bingeha yekîtiya nasnameyên cuda ne mimkun e. Sûriyeya nû ji bo hemû nasnameyên neteweyî û civakên baweriyan ên cuda, hewceyî têgihiştineke nû ya li ser bingeha wekheviya tam a mafan e. Ji ber vê yekê, daxwaza naskirina Kurdî di destûra bingehîn a nû de wekî zimanê fermî, ne tenê daxwazeke sembolîk e. Heke hemû pêkhateyên Sûriyeyê xwedî mafên wekhev bin, ev wekhevî divê di ziman, perwerde, çand û jiyana siyasî de jî bête misoger kirin. Divê Kurdî wekî zimanekî Duyemîn bête dîtin û di destûra nû de wekî zimanê fermî cih bikişîne.

Naskirina zimanên hemû gelên ku li welat dijîn, dikare bibe bingeha jiyaneke wekhev. Bêyî garantiya destûrî, azadiya zimanan nayê peydakirin. Lê dema ku mafê zimanî gihîşt garantiya destûrî, ew ji bo nifşên pêşerojê jî dibe piştek civakî û hiqûqî. Nifşekî nû yê ciwanan mezin bû. Ev nifşê ciwan, di nav sîstema perwerdehiyê ya rêveberiya xweser de, bi zimanê dayika xwe perwerde dît. Ev ciwan bi hişmendiyeke nû mezin bûn. Ji bo wan ziman, beşek ji kesayetî û hafizeyê ya ku nayê veqetandin e.

Îro erka me ya herî girîng ev e: Rê li ber paşguhkirin, bêqîmetkirin an windabûna perwerdehiya ciwanan bigirin. Heke ciwanekî bi zimanê dayika xwe perwerde dîtibe lê diploma û perwerdehiya wî di qada herêmî an navneteweyî de neyê naskirin, tişta ku tê redkirin ne tenê perçeyek kaxez e. Elem û pêşeroja wî dixin metirsiyê. Ji ber vê yekê, pirsgirêka naskirina diplomayan tenê mijareke îdarî nîne; ew pirsgirêkeke siyasî û civakî ye.

Perwerdehiya bi zimanê dayikê dikare bibe bingeha kesayetiyeke azad, xwebawer û afirîner. Ciwanekî ku bi zimanê xwe difikire, dikare zimanên din jî fêr bibe û beşdarî civakeke piralî bibe. Pirzimanî ne qelsî ye; ew dewlemendiyeke civakî û hêzeke zanistî ye.

Zanîngehên Rojava û Pêşeroja Zanistê

Di vê çarçoveyê de, rol û girîngiya zanîngeh û dibistanên din ên li Rojava derdikeve pêş. Ew der navendên hilberîna zanînê û fikra azad in. Bi hezaran ciwanên ku ji dibistanên perwerdehiya Kurdî derketine; di warên bijîşkî, endezyarî, zanistên civakî, hiqûq û wêjeyê de bi zimanê xwe dixwînin û lêkolînan dikin.

Geşkirina Kurdî di qada zanistê de gaveke vital e. Ziman daxilî qada sînorkirî dibe dema ku tenê axaftina rojane bimîne. Lê dema ku ew dibe zimanê perwerdehiyê, lêkolînê, tezê, felsefeyê û zanistê, ew dibe amûra hilberîna zanînê. Heta ku mamoste, xwendekar û lêkolîner bi zimanê Kurdî hilberînê bikin, ziman dibe parçeyek ji pêşketina zanistî ya civakê. Zanîngehên Rojava hewceyî piştgiriya akademîk, hiqûqî û civakî ne. Diplomayên wan divê bêne naskirin, têkiliyên wan ên bi saziyên akademîk re divê bêne xurtkirin û derfetên domandina xwendinê û karî ji bo ciwanên wan bête rexşandin. Heke ev neyê kirin, dem û keda ku nifşekî ji bo perwerdehiyê daye, dê wekî ku tune be muamele bibîne.

Erka me wekî ciwanên Rojava ev e: Ji bo pêşxistina zanîngehan, parastina sîstema perwerdehiyê û naskirina diplomayên wan di asta herêmî û navneteweyî de têkoşîn bikin. Têkoşîna zimanê dayikê di heman demê de têkoşîna edaleta civakî, wekhevî û azadiyê ye. Parastina zimanê Kurdî, gihandina wî ya garantiya destûrî û piştgirîkirina zanîngehên me; şertê bingehîn e ku birikîna salên şoreşê û têkoşîna ciwanan heba nebe. Pênûsa ku şehîdan li pey xwe hiştiye, divê di destê ciwanan de bibe sembola zanist, azadî û afirîneriyê. Carinan berxwedan ew e ku tu bixwînî. Bi zimanê xwe binivîsî, zanînê bi zimanê xwe hilberînî. Li dijî ji bîrkirinê, parastina hafizeya civakê ye.

Ciwanên îro yên dibistan û zanîngehên Rojava, sibê dê bibin mamoste, bijîşk, endezyar, nivîskar û lêkolîner. Pêşeroja civakê di dibistan û zanîngehên îro de tê nivîsandin. Ji ber vê yekê, ciwan divê di rêzên pêşîn ên vê têkoşînê de cih bigirin.

Bi Kurdî bifikirin. Bi Kurdî bixwînin. Bi Kurdî biafirînin. Bi Kurdî lêkolîn bikin. Bi Kurdî rêxistin bibin û pêşeroja xwe bi zimanê xwe yê dayikê ava bikin. Ji bo ku zimanê me bijî, divê ew bête nivîsandin, xwendin, hînkirin û hilberandin. Ji bo ku keda van nifşan heba nebe, divê mafên wan bêne naskirin. Ji ber ku ziman tenê bîranîna rabirdûyê nîne; ew amûra avakirina siberojê ye.

Zimanê me hebûna me ye. Parastina zimanê me, parastina hafizeya me ye. Hilberîna zanînê bi zimanê me, avakirina pêşeroja me ye. Û zimanê me, di destê ciwanên Rojava de dê bibe pênûsa zanist, azadî û pêşerojê. Ev soza me ya têkoşînê ye.



Zanîngeha Rojava li dijî biryara Şam e ku zimanê Kurdî tenê sê saetan di hefteyê de bê hînkirin nerazîbûn nîşan da. Rêveberiya zanîngehê pêşniyar kir ku pergalek perwerdehiyê ya duzimanî (kurdî û erebî) bê pejirandin.

Dîtina şoreşgerî ya pêşengê komûnîst a li ser Rojhilata Navîn



Rojhilata Navîn bi salan e ku jiyaneke ji xwîn, hêsir û şer pêkhatî re hate mehkûmkirin. Dema ku reqabeta jeopolîtîk û aborî ya cîhanî ya di navbera hêzên emperyalîst de zêde dibe, daxwazên azadî û wekheviyê û têkoşînên civakî yên milyonan bindestan jî di heman serdemê de ber bi geşbûnê ve diçin.

Sînorên Rojhilata Navîn berî her tiştî ji aliyê hêzên emperyalîst ên Rojava bi taybetî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) û dewleta Îsraîlê ya siyonîst ve tê xwestin ku ji nû ve bên xêzkirin. Statûkoya ku berî sedsalê dîsa ji aliyê emperyalîstan ve hatibû avakirin, tê xerabkirin. DYA û dewletên mêtîngehkarên hevkarî yên li herêmê, ji bo ku dewlemendiyên Rojhilata Navîn ji nû ve parve bikin planeke şer a berfirehtir dikin. Dewletên ku hegemonyayê DYA û Îsraîlê qebûl nakin, bi alîkariya hêzên hevkarî tên tasfiyekirin û tê xwestin ku ji nû ve bên dîzaynkirin.

Dagirkerî û êrîşên komkujiyê yên siyonîst ên ku li Filistin û Lubnanê berdewam dikin û şerê hegemonyayê yê ku bi rejîma meleyan a Îranê re tê meşandin di heman demê de pêş ve diçin. Berberibûna li Rojhilata Navîn li Iraq û Suriyê jî da xuyakirin. Encama wêranker ên şerê hegemonyayê yê li herêmê derdikevin holê. Tê famkirin ku heta ku yekîtiya rêxistinên berxwedanê yên Rojhilata Navîn neyê dabînkirin, ev siyasetên komkujî û wêranî dê berdewam bikin.

Rojhilata Navîn tenê ji şeran pêk nayê. Di heman demê de rastiyeke din a herêmê jî ew e ku qada berxwedanê yê gelên bindest e. Tune hesibandina vê rastiyê, dîtina dîrokê ya tenê ji planên hêzên mêtîngehkar û famkirina şaş a geşedanên dîrokî ye. Bêyî dîtina berxwedana gelê Filistinê ya ku zêdetirî 60ê salî ye berdewam dike, ya têkoşina bindestên Ereban, ya Kurdan a bi şoreşa Rojava re, ya gelên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê ku bi serhildana Jîna Emînî re dest pê kiriye; tê wateya înkarkirina dîroka têkoşînê ya Rojhilata Navîn. Dîroka têkoşînê ya bindestan ji vê aliyê ve dîroka berxwedanan e ku ruyê xwe dide ber bi rizgarî, şoreş, hêvî û azadiya Rojhilata Navîn.

Fikra şoreşên herêmî ya li Rojhilata Navîn, nêrîna bernameyî ya Pêşengê Komûnîst e. Perspektîfa şoreşa herêmê û avakirina federasyonên demokratîk-sosyalîst, ji bo Pêşengê Komûnîst hem di warê teoriya şoreşgerî de hem jî di warê qadên têkoşîna siyasi de asteke girîng e. Ev perspektîf encama famkirina serdema ku cîhan û herêm tê re derbas dibe û rastiya madî ya civakî bû. Ji bo yekkirina hêzên şoreşger û antiemperyalîst ên li Rojhilata Navîn û heremê Balkanê li derdora şoreşa herêmê, hewldanên cuda yên Partiya Komûnîst hebûn. Li Filistinê bi rêxistinên şoreşger ên ku pêşengiya berxwedana li dijî Îsraîl a dagirker dikirin re pêwendiyên berçav hatin danîn.

Îro hêzên emperyalîst ji bo vemirandina agirê şoreşê siyaseta qirkirin û tasfiyeyê dimeşînin. Geşedanên ku li Rojhilata Navîn bi serhildanên gelê Ereb re dest pê kirin, agirê pêvajoya şoreşeke herêmî ku ji Filistinê heta Îranê cografyayeke berfireh bandor dike, geş kir. Şoreşa Rojava di vê hemû demê de rola fîşeka nîşanê ya Rojhilata Navîn lîst û cesaret da hemû hêzên şoreşgeran. Ev hatin îspat kirin ku, têkoşîna desthilatdariya çekdarî ya bindestan rojaneyî ye.

Li welatên ku serhildanên gel ên Ereb lê çêbûn, nehatina avakirina desthilatdariyên şoreşger encama destwerdana rasterast a emperyalîstan bû. Nirxandinên mîna ku gelên Rojhilata Navîn ên ku piraniya wan Misliman in demokrasiyê naxwazin ji rastiyê dûr in. Berevajî vê, Bihara Erebî di dîroka herêmê de yek ji têkoşînên girseyî yên siyasi yên herî girîng derxist holê. Kêşeya bingehîn ew bû ku bindestan nedikarîn bibe xwedî zanebûn û rêxistinbûna ku bikaribe şoreşê bike. Girseyan nedikarîn bi hêzeke şoreşger û komûnîst re ku dê pêşengiyê ji wan re bike re bibe yek. Rojava bû bersiva pratîkî ya ku gava girseyî bi pêşeng re dibe yek dikare çi bike. Partiya Komûnîst girêdayiya xwe ya bi şoreşê re di avakirin û bereyên parastinê yên Rojava de nîşan da.

Partiya ku di 10ê Îlona sala 1994an de hat avakirin, xwe wekî partiya Tirkiye û Kurdistanê îlan kir. Partiya Komûnîst di nav şoreşa Rojava ya ku di havîna 2012an de dest pê kir de cih girt. Ev gava yekem ku bi hêzeke mitewazî hatibû avêtin, bi kedên ji bo avakirin û parastina şoreşê hatine dayîn re veguhast wesfeke mezin. Partî li kêleka erka xwe ya leşkerî, di nav girseyên gel de jî xwe birêxistin kir û sazîbûna xwe ava kir.

Partî mezinkirina şoreşa Rojava û belavkirina wê ya li hemû herêmê ferz dîtin. Sedema bingehîn a vê tiştî, dabînkirina yekîtiya têkoşînê ya hemû netewe û baweriyên bindest ên li herêmê û veguhastina azadî û şoreşê ya ber bi gava rizgariya hemû herêmê ve bû. Ya duyemîn jî, ji bo ku şoreş li ser piyan xwe bimîne hewcedarî bi xurtbûneke zêdetir hebû. Ji bo vê yekê, yekbûna bi hemû gelên bindest ên herêmê re dikaribû roleke dîrokî bilîze.

Pêşengê komûnîst ê ku xeta welatparêziya sosyalîst esas digire, partiya çîna karkeran û hemû bindestan e. Partî yekîtiya têkoşîna şoreşger a gelên bindest û şoreşa jinê esas digire. Xwedî perspektîfeke têkoşînê ya herêmî ye ku lingên xwê li ser axa Kurdistanê ne û ji vir dirêjî hemû Rojhilata Navîn dibe. Nehatina yekbûna şoreşê bi rêxistinên din ên berxwedanê yên Rojhilata Navîn re, kêşeyeke bingehîn bû ku em îro encamên wê dijîn.

Partî di nav şoreşa Rojava de ya ku ji îtîfaka gelên Kurd û Ereb xwedî dibe û gelên din di nav xwe de digire xwe birêxistin kir. Ji bo parastina şoreşa Rojava û avakirina Suriyeyeke demokratîk xebata şoreşgerî girîng dît. Di mijara ku hemû gelên li Rojava û Suriyê bibin xwedî wekheviya mafên tevahî de bi dîtineke net tevgeriya.

Li Rojava tevî gelê me yê Kurd, wekheviya mafên tevahî ya gelên Ereb, Suryan, Asûr, Ermen, Çerkes û Turkmenan parast û ji bo vê têkoşîn kir. Ji ber ku zanebûna ku bi reya şoreşa Rojava diyar bibe û yekbûna hêrsa gelan a li dijî siyasetên şer, ji bo geşbûna şoreşa herêmî xwedî girîngiyeke stratejîk bû. Parçebûnên ku hêzên emperyalîst û dewletên paşverû yên herêmê di navbera gelan de li ser bingehê ziman, dîn û mezheban çêkiribûn, tenê bi vê awayî dikaribûn bêne çareserkirin. Partiyê ji gelan re rave kir ku parastina hevpar a şoreşê destkeftî û rizgariya wan bixwe ye. Karker, jin û hemû kedkarên ji netewe û baweriyên cuda dikaribûn bi awayekî wekhev jîyan bikin. Hebûna partiyê ya li Rojava, hem ji bo têkoşîna li ser rêya yekbûna parçeyên Kurdistanê, hem jî encama perspektîfa bûn û dîtina xwe ya wekî kirdeya hewldana belavkirina şoreşê ya li herêmê bû.

Li hemberî şerên ku Rojhilata Navîn wêran kirin, şoreşeke ku dê hemû herêmê azad bike guncavbûna xwe diparêze. Ev erka dîrokî barekî mezin xistiye ser milên çîna karker û bindestên ku li derdora Pêşengê Komûnîst bûn yek. Em di serdemeke ku bilindkirina ala berxwedana şoreşger a li dijî ferzkirinên teslîmiyet û tasfiyekirin xwedî girîngiyeke dîrokî ye re derbas dibin. Partiya Komunîst di salvegera 32emîn a avakirinê de, bang li hemû hêzên berxwedanê yên Rojhilata Navîn dike ku ji bo Rojhilata Navîneke azad, demokratîk û sosyalîst têkoşîna antiemperyalîst, antimêtîngehkar û antîfaşîst mezin bikin.

Dema ku berxwedana gelan bi pêşengê xwe re bibe yek, wateya sînoran winda dibin. Bi vê zanebûnê û bi gavên rêxistinbûnê yên xurt ber bi şoreşa Rojhilata Navîn ve bişeminin!

Ji bo Ahmet Polad û hemû êsîran azadî

Tevgera Komunîst a Şoreşger (TKŞ), di roja 200an ya dîlgirtina rojnameger Ahmet Polad ê ku ji aliyê çeteyên cîhadîst ên HTŞê ve hatibû dîlgirtin de, li Qada Şehîdan a Qamişloyê çalakiyek li dar xistin. Di çalakiya ku malbatên êsîran jî beşdar bûn.

Dilşêr el Derwîş ê ku daxuyanî da, bi bîr xist ku rojnamegerê enternasyonalî Eva Maria Michelmann a ku tevî Ahmet Polad li Raqayê hatibû dîlgirtin, bi rêya têkoşîna hatî meşandin gihîştiye azadiya xwe. Derwîş bal kişand ser xetereyeke li ser jiyana Ahmet Polad û wiha got: "Çeteya HTŞê daxwazên malbat, parêzer û saziyên navneteweyî yên ji bo pêwendî danîna bi Ahmet Polad re qebûl nake. Serlêdana hevdîtinê ya parêzerê Ahmet Polad ê li Şamê hat astengkirin, dest hat danîn ser belgeya wekaletê ya fermî ku ji aliyê malbatê ve hatibû şandin."

Derwîş bang li hemû saziyên mafên mirovan, rêxistinên çapemeniyê yên li Ewropa, Rojhilata Navîn û Rojava û hemû raya giştî ya şoreşger-demokrat kir ku hişyar bin û diyar kir ku divê têkoşîna ji bo azadiya Ahmet Polad û hemû êsîran bê mezin kirin.

Çalakîyeke li ber Neteweyên Yekbûyî

Komûnîstên Rojavayî biryar dan ku ji bo azadiya Ahmet Polad ê ku bi mehan e di destê çeteya HTŞê de êsîr e, her heftê çalakiyê bikin.

Çalakiya yekem li ber avahiya Neteweyên Yekbûyî ya li Qamişloyê hate kirin. Tevî endamên TKŞ, JKŞ û CKŞê, malbatên êsîran jî beşdarî çalakiyê bûn. Di çalakiyê de pankarta bi nivîsa "Ji Ahmet Polad û hemû êsîran re azadî" hat vekirin.

Endamê Meclîsa Giştî ya TKŞê Ronî Qamişlo wiha got: "Wekî Komûnîstên Rojavayî, me ji bo fêrbûna aqûbeta rojnameger Ahmet Polad têkoşîn kir. Heta ku Ahmet Polad bigihîje azadiya xwe jî em ê dest ji vê têkoşînê bernadin. Ahmet Polad û hemû êsîran ku di zindanên HTŞê de tên girtin divê demildest serbest bên berdan."

Faîze Mîhamed Latîf Xalîl a ji malbatên êsîran ku beşdarî çalakiyê bibû jî banga "Divê herkes xwedî li êsîran derkeve" kir. Çalakî bi dirûşmên "Ji Ahmet Polad re azadî" û "Ji hemû êsîrên Rojavayî re azadî" bi dawî bû.

Di hefteyên piştre de, Komunîstên Rojavayî bi rêya daxuyaniyên çapemeniyê û çalakiyên xwe li bajarên Heseke û Qamişloyê şîara "Azadî ji bo Ahmet Polad" berfireh kirin.

Li Qamişloyê pankart hat daliqandin

Endamên TKŞê li navenda bajarê Qamişloyê pankarta bi nivîsa "Ji rojnameger Ahmed Polad re azadî" daliqandin.







Banga Pirsûsê; xwedîderketina li şoreşê ye

Komûnîstên Rojavayî ji bo bîranîna şehîdên Pirsûsê li Qamişlo, Hesekê û Kobanê bîranînên li dar xistin.

Li **Qamişlo** di bîranîna ku li Pakrewangeha Şehîd Delîl Sarûxan hat lidarxistin de endamên Meclîsa Malbatên Şehîdan jî cîh girtin. Bîranîn bi deqqeyeke rêzgirtinê dest pê kir. Ekîn Îsyan a ku li ser navê TKŞê axivî, destnîşan kir ku şehîdên Pirsûsê di demên herî zehmet de ruyê xwe dan ser şoreşa Rojava û mînakeke mezin a fedakariyê nîşan dan. Ekîn Îsyan bal kişand ser gefên li ser pêşeroja Rojava û wiha axivî: "Em di qonaxeke girîng re derbas dibin. Çeteyên cîhadîst ên Colanî bi navê 'entegrasyonê' teslîmiyet û tasfiyeyê li ser me ferz dikin. Niha dema xwedîderketina li şoreşa Rojava ye. Ji ber vê yekê em dibêjin; banga Pirsûsê xwedîderketina li şoreşê ye." Piştî axaftina li ser navê Meclîsa Malbatên Şehîdan, nîşandana sînevîzyoneke ya ku 33 şehîden Pirsûsê vedibêje hat kirin.

Bîranîna li **Hesekê** li avahiya TKŞê hat li dar xistin. Di bîranîna ku bi deqqeyeke rêzgirtina ji bo bîranîna şehîdan dest pê kir de Berdevka TKŞê Fadya Sîdo axivî. Fadya Sîdo destnîşan kir ku xwedîderketina 33 şehîdên Pirsûsê ya li şoreşa Rojava xwedî wateyeke dîrokî ye û diyar kir ku çav li ser êrîşa komkujiyê ya DAİŞê re hat girtin. Fadya Sîdo bang li gelên Rojava kir ku li ser rêya şehîdên Pirsûsê destkeftiyên şoreşê biparêzin. Bîranîn bi dirûşmên "Şehîd namirin" û "Bijî berxwedana Rojava" bi dawî bû.

Şehîdên Pirsûsê Kobanê ye

Ji bo 33 ciwanên ku beriya 11 salan li Pirsûsê hatibûn qatilkirin, li ber Parka Şehîdên Pirsûsê ya **Kobanê** hatin bîranîn.

Mîzgîn Erebo ku li ser navê TKŞê axivî, destnîşan kir ku 33 ciwanên sosyalîst ji bo ku werin Rojava û di navbera her du aliyên sînor de pira hevgirtinê ava bikin, dixwestin bixebitin. Mîzgîn Erebo wiha dewam kir: "Wan ji bo beşdarbûna vê berxwedana lehengî ya ku me li hemberî çeteyên DAİŞê da dudilî nejiyan. Ji bo bîranîna wan li Kobanê Parka Şehîdên Pirsûsê û daristan hat çêkirin. Xeyalên wan ên ku nîvco mayîbû ji aliyê hevreyên wan û gelê Kobanê ve hatin pêkanîn."

Mîzgîn Erebo bal kişand ku wan di rêya şehîdên Pirsûsê de têkoşînê xwe berdewankirin û got: "Ji bo belavbûna azadiyê ji Rojava heta hemû bajarên Suriyê, em ê têkoşîna xwe ya hîn mezin bikin. Em ê ala azadiyê, ala edaletê û ala wekheviyê yên şehîdên Pirsûsê ji bo jinan û hemû gelên bindest hîn bilindtir bikin. Li dijî yên ku ziman, nasname û hebûna neteweyî ya gelê Kurd qebûl nakin; yên ku bi navê entegrasyonê teslîmiyet û tasfiyeyê li ser gelê me ferz dikin, em ê têkoşîna xwe bidomînin. Şehîdên Pirsûsê Kobanê ye. Kobanê Rojava ye. Rojava Kurdistan e." Bîranîn bi dirûşmên "Şehîd namirin" û "Bijî berxwedana Kobanê" bi dawî bû.







Sêmînerên li ser pêvajoya entegrasyonê:

‘Pêşeroja Rojava dê bi sekna gel a li qadan bên diyar kirin’

Komunîstên Rojavayî, di derbarê geşedanên li Rojhilata Navîn û Sûriyeyê de li bajarên Hesekê û Qamişloyê sêmînerên li dar xistin. Sêmînerên ku li her du bajaran di Parkên Xwendinê de hatin çêkirin, bi beşdarbûna bi dehan kesan hate pêk anîn. Li salonên sêmînerê pankarta bi şîara "Parastina Rojava, parastina destkeftiyên şoreşê ye" hate daliqandin. Sêmînerên ku Endamê Meclisa Giştî ya TKŞê Cemîl Sidwo axaftvanê wan bû, bi deqqeyeke rêzgirtinê dest pê kirin. Di sêmîneran de beşdarvanan jî mafên soz girtin û nêrînên xwe anîn ser ziman.

Cemîl Sidwo anî ser ziman ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ya emperyalîst ji bo xurtkirina hegemonya xwe ya aborî û siyasî dest bi hemleyeke nû ya stratejîk kiriye û wiha axivî: "DYA û Îsraîla Sîyonîst, dixwazin nîzama ku li Rojhilata Navîn hatî avakirin biguherînin û li gorî berjewendiyên xwe ji nû ve dîzayn bikin. Bi şerê herêmî, dorpêçkirin, dagirkerî, cezayên aborî, tarîfeyên nû yên gumrikê û peymanên dîplomatîk nîzameke nû ya Rojhilata Navîn tên ferzkirin." Cemîl Sidwo gotiye ku çeteya HTŞê ya cîhadîst ku li Îdlibê di bin parastina emperyalîstan de dihat perwerdekirin bo Şamê hate veguhastin û van tiştan anî ser ziman: "Di vê navberê de, DYA ya emperyalîst li Sûriyeyê ji serweriyê serket. Rolên da dewleta Tirk a mêtîngehkar û dewleta Îsraîlê ya dagirker. Îsraîl, tunekirina hemû çekên giran yên li Sûriyê misoger kir. Dewleta Tirk a mêtîngehkar jî, rola piştevanê herêmî ya HTŞê girt ser xwe, li ser navê çeteyan beşdarî civînên navneteweyî bû."

‘Entegrasyon Kemîneke Asîmîlasyon Û Teslîmiyetê Ye’

Cemîl Sidwo anî ser ziman ku HTŞ û çeteyên girêdayî dewleta Tirk avahiya Rojava ya demokratîk, gelparêz û azadîxwaza jinan dikin armanc. Cemîl Sidwo wisa got: "Hergavê ku HTŞ davêje, êrîşeke giştî ya dijî-şoreşê ye ku bi daxwaza emperyalîst û mêtîngehkaran tê rêxistinkirin. Divê fermîkirina hebûna van çeteyên li Şamê neyê qebûl kirin. Di vê serdemê de, bi destê çeteyan cîhadîst-selefî gefên nû yên qirkirin û komkujiyan ku hemû netewe û baweriyên bindest ên li Sûriyê dikin armanc hatine afirandin.

Axa Rojava; ji aliyekî ve bi gefa dagirkeriyê ya çeteyan re, ji aliyê din ve jî bi ferzkirinên 'entegrasyona siyasî' ku armanc dike Rêveberiya Xweser di nav avahiya nû ya dewletê de bihêlîne û daxîne re rû bi rû ye. Ev du rûyên ya konsepteke tesfiyekerê ne ku armanc dikin dînamîkên şoreşgerî qels bikin, ji pîştgiriya gel bêpar bihêlin, bêçek bikin û di encamê de ji holê rakin."

Sidwo di dewamiya axaftina xwe de pêvajoya yekkirina QSD bi Artêşa Sûriyê re jî girt dest û wiha axivî: "Armanca wan, qelskirina hêza leşkerî ye ku axa şoreşê diparêze. Entegrasyona hêzên şoreşê di nav amûrê tundiyê ê di bin yekdestîya dewleta burjûva de; teslimkirina gel a li ber rehma mêtîngehkar, çeteyên cîhadîst û emperyalîstan e. Tune hesibandina qanûnên jinan û nepejirandina hêza çekdar a jinan YPJyê ku nîvê şoreşê ye, nîşan dide ku tasfiyekirina hemû destkeftiyên ku deriyê azadiyê di hemû qadên jiyanê de ji jinan re vedikin tê armanc kirin."

‘Dermanê Tasfiyekariyê, Girêdanbûna Bi Şoreşê Re Ye’

Cemîl Sidwo anî ziman ku li hemberî entegrasyonê rawestineke zelal pêwîst e û wiha berdewam kir: "Yekane dermanê li dijî tasfiyekariyê zelaliya îdeolojîk û girêdanbûneke bêdawî bi şoreşê re ye. Bersiva ku dê li hemberî vê dorpêça mêtîngehkar were danin; seferberkirina hêza berxwedanê ya rêxistinî ya gel, parastina destkeftiyên şoreşgerî û afirandina çepereke berxwedanê ya topyekûn e ku yekîtiya têkoşînê ya hemû netewe û baweriyên bindest ji bo afirandina Sûriyeyeke demokratîk misoger dike. Yekane çareserîye ku dê lîstika dabeş bike-parçe bike-birêve bibe ya dewleta burjûva xerab bike; di serî de Kurd û Ereb, cepheya têkoşîna hevpar a kedkar û jinên ji hemû netewe û baweriyên bindest e. Şoreşa Rojava di fetlokeke dîrokî de ye. Pêşeroja Rojava, ne li ser maseyan; di qadan de ku hêza xweser û rêxistinî ya gel vediguhere çalakiya siyasî dê bên diyar kirin."





Yılmaz Behrareş li bajarên Rojava hate bîranîn

Komunîstên Rojavayî, Yılmaz Behrareş (Osman Nûrî Ocakli) ku di 12ê HezîranHê 2023an de di encama êrîşa hewayî ya dewleta Tirk de nemir bû, li ser gora wî ya li Hesekê û li Kobanê û Qamişloyê bi bîr anîn.

Bîranîna li **Hesekê** di şexsê Yilmaz Behrareş de bi deqqeyeke rêzgirtin ji bo şehîdan dest pê kir. Berdevka TKŞê Fadya Sîdo ku di bîranînê de axivî, jiyana têkoşînê ya Yilmaz Behrareş vegot: "Wî her dem ji bo partiyê fedaqarî û berxwedan nîşan da. Ne tenê ji bo gelê Kurd; ji bo gelên Ereb, Suryan, Ermen, Çerkes û hemû gelên bindest şer kir. Ji ber ku ew rêhevalekî enternasyonalîst bû. Me soz danin, em ê rêya şehîdan bişopînin." Piştî axaftinan, Komûnîstên Rojavayî kulîlk danîn ser gorên şehîdan û mûm pêxistin.

Endamên TKŞ û JKŞê, ji bo pêşengên komûnîst Yılmaz Behrareş û Zîlan Destan li **Kobanê** bîranîneke li dar xist. Di bîranînê de soza meşîna li ser rêya şehîdan hate nûkirin, rawestina têkoşer û şoreşgerî ya şehîdan wekî mînak hate nîşandan. Hate destnîşankirin ku şehîdan di hemû qadên jiyanê de têkoşîna ji bo sosyalîzmê mezin kirine. Bîranîn bi dirûşmeyên “Jin Jîyan Azadî” û “Şehîd namirin” bi dawî bû.

Bîranîna ku li avahiya TKŞyê ya li **Qamişlo**yê hate li dar xistin, ji bilî endamên TKŞ, JKŞ û CKŞê, malbatên şehîdan û Elewiyên ku ji komkujiya HTŞyê revîbûn beşdar bûn. Di bîranîna ku nîşandana sînevîzyonê hatî kirin de wiha hatin gotin: “Ji bo azadiya hemû gelan û çîna karkeran em li ser rêya şehîdan re ne. Wekî gelên Kurd, Ereb, Suryan, Ermen, Çerkes û Turkmen em ê her tim li hemberî kapîtalîzm û mêtingehkariyê bisekinin." Beşdarvanên bîranînê jî mafê soz girtin û soza bilindkirina ala sosyalîzmê danin







Serê Kaniyê...

Bîranîna bajarekî ku hê jî li benda vegera gelê xwe ye

Nêzîkî heft salan berê, bajarê Serê Kaniyê derbasî qonaxeke nû ya dîrokî bû. Serdemek ku bi êş, koçberî û wêraniyê hatibû nîşankirin, lê di heman demê de dê bi berxwedan û îradeya xurt jî dihat naskirin. Bajar, di dema şerê navxweyî yê Suriyê de di nav wan deveran de bû ku rastî êrîşên mezin û giran hatibûn dîtin. Ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wan ve di bin navê "Operasyona Kaniya Aştiyê" de êrîşeke leşkerî ku ti aşitî tê de tune bû hat kirin. Bi hezaran sivîl neçar man, ji wan axên ku bi dehsalan li ser vê jiyanbûn birevin û malên xwe terk bikin. Di wê demê de, Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) li hemberî êrîşa dagirker ku bajar û derdora wê armanc dikir, xurt sekinî. Ji bo parastina gel û pêşîlêgirtina ketina herêmê ku bikeve bin kontrola dijmin de, şerên parastinê yên dijwar meşandin.



Serê Kaniyê di bin mercên tevlîhevî yên herêmî û navneteweyî de şahidî ji berxwedaneke leşkerî û siyasî re kir. Bû sembola berxwedanê gelan. Bi taybetî di serdemeke ku di serî de Dewletên Yekbûyî ya Amerikî (DYA) hêzên navneteweyî helwesta xwe guhertin û peymanên nû yên bi dewleta Tirk re rêça geşedanan guhertin. Piştî êrîşên dagirkeriyê yên ku heyameke berdewam kirin, bi navbeynkarîya hêzên emperyalîstan lihevkirin hat kirin. Ferzkirin bûn sedema vekişîna hêzên HSDyê ji bajêr. Vê yekê bandoreke kûr li ser gelê Serê Kaniyê hişt ku xwe ji axa xwe koçberbûyî dîtin. Pirsgirêka Serê Kaniyê, li ser erdê ne tenê mijareke guhertina leşkerî bû. Ew qeyraneke mirovî bû ku bandor li pêşeroja bi hezaran malbatên ku mal, çavkaniyên debarê û bîranînên xwe winda kiribûn dikir.

Bi derbasbûna salan re, rewşa siyasî li Suriyê hat guhertin. Di hevsengiyên hêzê û têkiliyên di navbera aliyan de guhertinên girîng çêbûn. Têkildarî pêşeroja welat peymanên nû -di nav de gotûbêjên li ser lihevkirin û yekkirina hêzên cûrbecûr- derketin holê. Di nava van geşedanan de, behsa vegera kesên koçberkirî bo axa wan hat kirin. Ev fikir li ser wê prensîbê hatibû avakirin ku mafê vegera bo mal û axa xwe, mafekî bingehîn e. Lêbelê vegerina karwanê yekem ya koçberan Serê Kaniyê, ne wekî ku gelê bajêr xeyal dikir pêk hat. Di demekê de ku diviya ev tişt bibe destpêka serdemeke aramî û lihevanînê, hinek ji vegeriyayan rastî êrîş û provokasyonên çeteyan cihadist li herêmê -kesên ku li gorî gotina gel ji deverên wekî Xwêyran û Neşweyê hatibûn anîn- hatin dîtin.

Çeteyan rê li ber vegera gelê Serê Kaniyê û xwediyên milkan girtin ku vegerin malên xwe. Rastî êrîş û tacîzê hatin dîtin. Vêca beşeke mezin a gelê bajêr hîn jî li benda vegera ser axa xwe ne. Tiştê ku li Serê Kaniyê diqewime, nayê wê wateyê ku ew tenê bûyereke veqetandî ye. Belkî ew beşek ji nakokiyeke berfirehtir e derbarê nasname, pêşeroj û guhertina demografîk a herêmê de.

Lê belê ev tiştên ku qewimîn, tenê bi Serê Kaniyê re sînordar nîn in. Êrîşên mîna vê li dijî gelê Efrînê jî hatin kirin. Gelê Efrînê ku bi salan ji bajêra xwe hatin koçberkirin, malên wan hatin talankirin û wêrankirin, bi hezaran hatin kuştin, revandin, destdirêjkirin û rastî binpêkirina mafan hatin, zilmên mezin dîtin. Piştî peymanên hatin kirin, gelê Efrînê vegeriyan mal û axa xwe. Lê di karwanê yekem de rastî êrîşê hatin dîtin. Ev tişt jî ji me re dide xuyakirin ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wan dixwazin tevlîhevî derxin ku ev veger negehîje armanca xwe.

Astengkirina mafê vegera li malên xwe ê gelê herêmê, li şûna ku rê li ber çareserî û aştiyê veke, metirsiya kûrkirina dabeşbûnan di nav gel de û gurkirina nakokiyan zêde dike.

Avakirina nû ya Suriyê; bi tunehesibandina Kurdan, dûrxistin û ferzkirina nû bi zorê li ser hesabê gel pêk nayê. Berevajî vê, ew pêwîstî bi misogerkirina mafê vegera bi ewlehî û bi rûmet ê gel, parastina milkên sivîlan û di heman demê de cezakirina çeteyên ku dest danîne ser mal û milkên gel, heye.

